

# Belavok ji bo serperîştên guhdanê

## 1. Giştî

Li çarçoveya wan koma erkên ku bo te hatine sipartin, erkê te ye, ku tu hay ji xweşiya wî kesê pêdivî bi guhdanê hebî û ku tu nûneratiya wî kesî li ba dadgehê û li dervey dadgehê bikî. Her çende, ku guhdana wî bo te were sipartin jî, lê dîsa jî mafê wî yê qanûnî ji bo girêdana girêbestên qanûnî wek xwe dimîne.

Lê çênabe, ku tu nûneratiya wî kesî ji bo girêdana girêbestan li gel xwe bi xwe, li gel hevjinê xwe yan hevjinê/hevjîna te ya tomarkirî yan li gel mirovekî xwe ji dereca yekê (Dapîr û Bapîr, Dayik û bav, û zarokan) bikî. Û di vê çarçoveyê de ne giring e, ku tu bi xwe yan – nûnerê te – bi vê mijarê ve girêdayî be.

Xaleke serekî ya guhdanê, danûstandina şexsî ye, bi taybet hevpeyvînên şexsî ne. Heta tu karibî, li gorî daxwaziyên wî kesê pêdivî bi guhdanê, tevbigere, helebt heger ew daxwazên wî ne li dijî xweşiya wî bin.

Ji kerema xwe re di çarçoveya koma erkên xwe de, bibe piştevanê wê yekê, ku sûd ji wan derfetên jinavbirin yan başkirina nexweşiyan yan kêmdambûna kesê/kesa pêdivî bi guhdanê were kirin. Û divê tu her wiha alîkar bî, ku ew ji zêdebûna van derdan were parastin yan ku derencamên wan werin kêmkirin.

### a) Guhdana karûbarên şexsî

Guhdana karûbarên şexsî bi taybet guhdana tendirustiyê, niştecibûnê û sazkirina jiyane digire ber xwe.

### b) Guhdana karûbarên madî

Guhdana karûbarên madî te erkdar dike, ku tu mal û milkê wî bi şeweyekî bi rêk û pêk birêvebibî û ku tu di vê çarçoveyê de bi aqilane hay ji daxwazî û hêviyên wî kesê pêdivî bi guhdanê hebî. Divê mirov malê wî kesî li gorî rewşên aborî bi şeweyekî bide karkirin, ku sûdmend be û bi berdewamî ji bo wî kesê qasir bêtirîs be, anku parastî be.

## 2. Destûrpêdana dadgeha seratayî

Ji bo hindê mijarên giring pêdiviya te bi destûrdana dadgeha seratayî heye, bi taybet:

1. ji bo bicihkirina wî di saziyeke girtî de (wek nimûne nexweşxaneyeyeke nefsi) yan li beşekî girtî yê saziyekê ji ber xwebirîndarkirinê yan ji ber pêdiviya dirustkirina pişkinînê yan tedawîkirinê,
2. ji bo tedbîrên mîna bicihkirinê, heger hat, ku cihê niştecibûna hemdemî li saziyekê, li kampekê yan li saziyeke din ya vekirî be (wek nimûne, heger pêdivê be, ku bi rêyeke mîkanîkî, yan bi rêya dermanan yan bi şeweyekî ji bo demeke dirêj yan bi berdewamî were girtin),

**Têbinî ji bo 1. û 2.:** Bicihkirin yan tedbîrên mîna bicihkirinê divê werin bidawî kirin, heger şert û mercên wan ji holê rabûn.

3. Ji bo qebûlkirina pişkinîna rewşa tendirustî, ji bo çûna cihekî tedawîkirinê yan ji bo niştergeriyê tendirustî ji aliyê bijîjkî ve, heger metirsiyêke ciddî hebe, ku ew kesê pêdivî bi guhdanê wê ji ber vê tedbîrê bimire yan wê ziyaneke tendirustî ya dijwar û domdirêj were serê wî, helbet ev rêkar jê nagirin, heger mirov bizanibe, ku paşxistina van tedbîran wê ziyaneke bighînin wî kesî, yan heger hem serperîşt û hem jî bijîkê/bijîka wî heman fikir bin, ku dan, nedan yan redkirina destûrnameyê li gorî daxwaziya kesê/kesa pêdivî bi guhdanê ye, ew daxwaziya, ku li gorî madeya § 1901a ji qanûna mafên hevvelatiyan (BGB) hatiye tesbîtkirin.
4. Ji bo betalkirina girêbestên kirêkirina xaniyan ji bo malên niştecîbûnê, û her wiha ji bo daxwaniyên din, ku girêdayî bi betalkirina kirêkirina xaniyekî ne (wek nimûne betalkirina girêbestê bi xwedîya/xwedîya xanî re) – **pêdiviya te hîn berî betalkirina girêbestê bi vê destûrnameyê heye!** – (Li xala xwarê vegere „Girêbestên qanûnî yên yekalî“)
5. Ji bo girêbesta kirêkirina xaniyekî yan kompaniyekê, heger ew kirêkirin bihtir ji çar salan be yan heger pêdivî be, ku xanî ji te were kirêkirin,
6. Ji bo girêbestên qanûnî ji bo perçeyek erd (milkanî, mafê kirêkirinê), yan mafê hebûna perçeyek erd, wek nimûne ji bo kirîn û firotina perçeyek erd û deynkirina pere ji bo wî perçeyê erd (qerz, deynê li ser perçeyê erd),
7. Ji bo redkirina wergirtina mîratekê yan wesyetnameyekê û ji bo girêbesteke li ser mijara mîratê,
8. Ji bo hebûna mafê daxwazkirina mafekî (wek nimûne wergirtina perên tamîna li ser jiyane, ku êdî dema standina wan hatiye, betalkirina hesabên bankê, di haletên taybet de ji bo kişandina pere ji hesabê bankê),
9. Ji bo deynkirina pere ji bo kesê/kesa pêdivî bi guhdanê,
10. Ji bo lihevkerinê yan ji bo girêbesteke lihevhatinê, heger qîmetê wî tiştê, ku pevçûn li ser tê kirin ji 3.000,00 € bihir be. (Ev xal jê nagire, heger dadgehê ev lihevhatin bi nivîskî pêşniyar û tomar kiribe.)

Ev xalên hatine birêzkirin, ne tamam in. Heger mirov dudilî be û nizanbe ya rast çî ye, baştir e, ku mirov pirsê ji dadgeha seratayî bike.

**Girêbesteke**, ku bêy destûrnameya pêdivî hatibe girêdan, li destpêkê narewa dimîne. Giring e, ku mirov piştra daxwaziya destûrpêdanê ji dadgehê bike, û aliyê din yê girêbestê li ser vê mijarê agahdar bike. Helbet têrê nake, ku aliyê din yê girêbestê ji kesekî sêyem ve li ser vê mijarê were agahdarkirin.

**Girêbesteke qanûnî ya yekalî** (wek nimûne betalkirin), ku pêdivî bi destûrpêdanê ye, tenê hingî misogir e, heger berî girêdana girêbestê dadgehê destûr pê dabe.

### 3. Erkên giştî

Ji kerema xwe re bi kêmanî salê carekê dadgeha seratayî li ser rewşa şexsî ya kesê/kesa pêdivî bi guhdanê, agahdar bike.

Ji bo guhdana milk û mal, divê mirov her sal fatorekê pêşkêş bike. Divê mirov ji bo vê yekê dahat û xerciyên bi zelalî bi rêz bike û heger fatoreyên van dahat û xerciyên hebin, divê mirov wan fatoreyan jî pêşkêş bike. Li gorî hijmara wan tiştên di lîsteyê hatine birêzkirin, divê mirov wan fatoran li pey hev bi hijmar bi rêz bike.

Heger te pê zanî, ku hindêk rewş hene, ku mumkin e bihêlin, ku guhdan were rakirin yan sînordarkirin yan ku bihêlin, berferêkirina wê yan şertê qebûlêkirina wê pêwîst bibe, divê tu vê yekê ji dadgeha seratayî re bêjî.

Heman tişt misogir dibe, heger bicihkirin yan tedbîrên mîna bicihkirinê bêy zanebûna dadgeha seratayî hatibin bidawî kirin.

Heger mijarên kirêkirinê û mafê niştecibûnê jî ji koma erkên te bin, divê wê demê tu dadgeha seratayî yekser agahdar bikî, heger hat û hindêk rewş peyda bûn, ku bihêlin mirov fikaran li ser bidawîkirina kirêkirinê bike.

Ji kerema xwe re her guhertineke navnîşanê çêbibe, ji dadgeha seratayî re ragehîne.

Dadgeha seratayî çavdêriyê li ser karê te dike, şîretan li te dike û alîkariya te dike, bi taybet li dema hebûna pirsgerêkên birêvebirina guhdanê.

Û heger tu bixwazî, rêvebirîya guhdanê (Herêm yan bajarê serbixwe) dikare şîretan li te bike û alîkariya te bike, taku tu bikaribî bi erkên xwe rabî.

Guhdan di madeyên qanûnî de §§ 1896 heta 1908i ji qanûna mafên hevweletîyan (BGB) hatiye bi rêbaz kirin.